© Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz, Moskva 2011

# NE'MA CIHÛDA

## Pêşgotin

Cihûda bi vê ne'ma kin berbir'î h'emû bawermendêd Îsa Mesîh dibe. Li gora şe'dêd sedsalîyêd pêşinda xudanê vê ne'mê, Cihûdayê[f] birê Îsa Mesîh e (Metta 13:55; Marqos 6:3). Fe'mîna vê ne'mê nêzîkî ne'ma Petrûse[f] duda ye. Meremê vê ne'ma Cihûda ew e, wekî pêşîya wan meriva[f] bide girtinê, yêd ku Mizgînîyê t'evîhev dikin û hînkirinêd şaşe zîyank'ar bela dikin, mêriv dixalifînin[f] û e'mirê ner'ast hîn dikin. Xudanê ne'mê h'işk davêje wan, lê xwendevana dişidîne û dinivîse ku bawermend «bona wê bawerîya[f] ku carekê cime'ta Xwedêr'a hatîye dayînê» xîret kin. Ne'me bi şîret û r'azîbûneke h'ewas xilaz dibe.

### Serecema fikira ne'mê

Pêşgotin (1-2)
Xeyset û h'unurêd dersdarêd derew, hînkirin û k'etina wan (3-16)
Haş ji xwe hebin bawerîyê çawa xweyî kin (17-23)
R'azîbûn (24-25)

### Silavkirin

1 [1] Ji Cihûdayê xulamê Îsa
Mesîh, birayê Aqûb[f],
wer'a, yêd ku gazîkirî ne, ji Bav[f]
Xwedêda h'izkirî û xweykirîyêd
Îsa Mesîh in:
[2] De bira r'e'm, e'dilayî û h'iz-
kirin hê li we zêde be.

### Dersdarêd derew

[3] Delalno! Gava min dil kir, ku
ez bona vê xilazbûna[f] meye t'omerî
wer'a binivîsim, hingê min r'ê têr'a
dît bona vê yekê wer'a binivîsim û
dil bidime we, wekî hûn bona wê
bawerîya[f] ku carekê bona her t'im
cime'ta Xwedêr'a hatîye dayînê,

şer’ê xwe bikin. 4 Çimkî çend
meriv[f] dizîva k’etine nava we, ku
derheqa dîwana wanda hê pêşda
nivîsar bû. Ewêd nep’ak bin navê
k’erema[f] Xwedêyê me xwe dane
bênamûsîyê û Xudanê[f] me Îsa
Mesîh Xweyîkî bêşirîkî-bêheval
înk’ar[f] kirine.

5 Lê ez dixwazim bînime bîra
we, çawa hûn van h’emû tişta
zanin jî, ku Xudan cime’ta Xwe
ji welatê Misirê[f] xilaz[f] kir, paşê
qir’a yêd ku bawer nekirin anî*.
6 Û ew milyak’etêd[f] ku h’uku-
mê xwe xwey nekirin, lê cîyê
xwe şih’itandin, Xwedê wan bi
qeydêd h’eta-h’etayêye te’rîsta-
nîyêda xwey dike, bona wê R’oja
h’esabe Dîwanê. 7 Vê jî bîr nekin
çawa Sodom[f], Gomora û bajarêd
dor-berêd wan, mîna wan ji gur’a
Xwedê derk’etin qavî[f] kirin, ç’e’v
avîtine bedena başqe* û dîwana
agirîye h’eta-h’etayê ser xweda
anîn. Evana îdî bona me t’erz
û ders in.

8 Usa jî ew meriv pey xewna di-
k’evin, qalibê xwe dih’er’imînin,
dijenine serwêrtîya û heyînêd xwe-
yîr’ûmete jorin bêhurmet dikin*.
9 Lê Mixayîlê serekê milyak’eta[f]
ev yek nekir. Gava bona cinya-
zê Mûsa[f] r’abû mîrêcinr’a[f] k’ete
h’ucetê, turuş nekir ku bi gotinêd
bêhurmetkirinê* dîwana wî bikira,
lê got: «Bira Xudan li te hilê[f]!»
10 Lê ev merivana serederîyê wan
tişta nakin, k’îjana ku bêhurmet
dikin, lê çi jî mîna h’eywanêd
bêzare-bêziman bi binyat’î fe’m
dikin, bi wan jî unda dibin.

11 Wey li wan, ku r’îya Qayîn-
da[f] çûn, mîna Bilam[f] xalifîn[f],
pey k’ara xwe k’etine û mîna
r’aberîbûna Qorax[f] wê bela xwe
bibînin*. 12 Evana mesrefêd h’iz-
kirina* weda lek’e ne, t’evî we bê
xof dixwin-vedixwin, t’enê zikê
xwe diç’êrînin. Yêd ha, e’wrêd
bêave ji ber bê çûyî ne, darêd pa-
yîzêye bêber in, r’awava[f] r’akirî,
du car h’işk bûyî, 13 pêlêd be’rêye

* 1:5 Derk’etin 12:51; Jimar 14:29-30.
* 1:7 «Bedena başqe» li gora Destpêbûn 19:1-8 tê fe’mkirinê, ku mêra dest davîtine mêra û usa jî milyak’eta.
* 1:8 «Bêhurmet dikin» aha jî tê fe’mkirinê: «Dik’ifirin».
* 1:9 «Bi gotinêd bêhurmetkirinê» aha jî tê fe’mkirinê: «bi k’ifirîya».
* 1:11 Qayîn: Destpêbûn 4:3-8; Bilam: Jimar 22; Qorax: Jimar 16.
* 1:12 «Mesrefêd h’izkirinê» aha tê fe’mkirinê, ku bi hevr’a nan dixwarin û şîva Xudan derbaz dikirin (K’arêd Şandîya 2:46; 20:7, 11).

r’abûyî ne, ku çawa e’yba kirêd
wê mîna k’efê ser dik’eve. Ew
steyrkêd xalifî ne, bona k’îjana
dûxana te’rîstanîyê h’eta-h’etayê
xweykirî ye.

**14** Henox jî ku pey Ademr’a[f]
bavê h’efta bû, bona van meriva
p’êxembertî[f] kir û got: «Va ye
Xudan t’evî pîrozêd[f] Xweye bêh’e-
sab tê*, **15** wekî dîwana h’emûya
bike û h’emû nep’aka neheq ke,
bona h’emû kirêd wane nep’ak û
bona wan h’emû gotinêd xirab,
ku nep’akêd gunek’ar[f] hindava
Wîda xeber dan». **16** Evana me-
rivne bîntenge fiş-fişko ne, pey
xwestinêd dilê xwe diçin, ji xwe
mestir xeber didin û bona k’ara
xwe h’ilek’arîya dikin.

## Şîretêd qenc

**17** Lê hûn delalno, wan gotinêd
ku şandîyêd[f] Xudanê me Îsa Mesîh
pêşda gotine bîr bînin, **18** ku wer’a
digotin: «R’ojêd axirîyêda merivêd
qerfkir wê derên, pey xwestinêd
dilê xweye nep’ak her’in»*. **19** Ev ew
meriv in, yêd ku dutîretîyê dikin,
yêd ku bi merivayî têne r’êberîkiri-
nê, ne ku bi R’uh’ê Pîroz. **20** Lê hûn
delalno, xwe bidine ser avakirina
bawerîya xweye pîroz, bi R’uh’ê[f]
Pîroz dua bikin, **21** xwe nava wê
h’izkirina Xwedêye hindava xweda
xwey kin, hîvîya r’e’ma Xudanê
me Îsa Mesîh bin, ku jîyîna[f] h’e-
ta-h’etayê bide we. **22** Û hindava
dudilîyada r’e’m bin*. **23** Hineka jî
ji agir bir’evînin xilaz kin, dilê we
ser yêd mayîn jî bi tirs bişewite, lê
jîyîna wane gunek’are mîna k’inca
lewit’î ber ç’e’vê we r’eş be*.

## Şikirdayîn

**24** Wîr’a, Yê ku dikare we ji
k’etinê xwey ke û li ber r’ûmeta
Xwe bêqusûr eşq bide sekinandinê,
**25** Xwedêyê bêşirîkî-bêheval, Xi-
lazkirê[f] mer’a, bi destê Îsa Mesîhê
Xudanê me, şikir û mezinayî, qud-
ret û h’ukumet be, berî her-heyê
û niha jî û h’eta-h’etayê! Amîn[f].

---

* 1:14 Destpêbûn 5:18-24.
* 1:18 Petrûs II, 3:3.
* 1:22 Aha jî tê fe’mkirinê: «Dudilîya bişidînin».
* 1:23 Aha jî tê fe’mkirinê: «H’eyfa we wî kirasê ji bedena wan lewit’î neyê».